**Li Tirkiyeyê du hefteyên dawîn**

**1-15 Berfanbarê, 2022**

**1ê Berfanbarê, 2022**

**Bi hinceta ku heqaret li Serokomar kiriye, ceza li Sevîl Topaloglu Uçak hat birîn**

Sevîl Topaloglu Uçak di civîna çapemeniyê de ku di 2ê Adara 2021î de li Samsûnê ji aliyê Hevgirtina Jinan ve hat lidarxistin, daxuyaniya çapemeniyê xwend. Di daxuyaniyê de betalkirina Peymana Stenbolê dihat rexnekirin. Salek û 2 meh cezayê girtîgehê li Uçakê hat birîn. Dadgehê bi rêjeya 1/6 ceza daxist 11 meh û 20 rojan û eşkerekirina biryarê taloq kir.



Sevîl Topaloglu Uçak ji ber îfadeya "bêrû" ku di daxuyaniya çapemeniyê de hatibû bikaranîn dihat darizandin. Di daxuyaniya de peyv wiha derbas dibû: "Serokomarê vî welatî kesê ku tecawizî zarokê xwe kiriye ceza nekir, lê hatiye Peymana Stenbolê betal dike, ango ev qas bêrû ye."

Ji ber van gotinan der barê Uçakê de bi hinceta ku bi eşkereyî heqaret li Serokomar kiriye doz hat vekirin.

Piştî cezagirtinê Uçak, bal kişand ser gotinên Serokomar ên der barê kesên ku beşdarî çalakiyên Geziyê bûbûn: “Van terorîst û eşqiyayan bi şûşeyên bîrayê hundirê mizgeftê pîs kirin. Ev kurmî ne, ev genî ne”. Uçak wiha berdewam kir: “Dibêjin li hember hiqûkê her kes wek hev in, lê gotinên Serokomar wekî sûc nehatin dîtin, ez hatim cezakirin. Ew qanûnan li gorî xwe bi rê ve dibin, me ev careke din ev yek dît”.

**Li polîsên ku li rojnameger Beyza Kural dabûn, 6 hezar lîre cezayê pereyî hat birîn. Dê polis vî pereyî bi 10 texsîtan bidin.**

Di 6ê Mijdara 2015an de, ango di salvegera damezrandina Lijneya Hîndekariya Bilind de(YOK) li ber Kampusa Beyazitê ya Zanîngeha Stenbolê çalakiya protestoyî hatibû lidarxistin. Beyza Kural wekî rojnameger çalakî dişopand. Sê polîsan hewl da ku wê ters kelepçekirî binçav bikin. Kural li



wan polîsan gilî kir û ev heft sal in doz didome. Rûniştina dawî ya dozê li 35emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Çaglayana Stenbolê hat dîtin.

Dadgehê biryar da ku polîsên bersûc "azadiya kar û xebatê bin pê kirine". 6 hezar lîre cezayê pereyî li polîsan hat birîn. Ew ê vî pereyî bi 10 texsîtan bidin. Ji ber ku polîsên bersûc K.A û Y.Ş berê di dosyeyeke din de hatibûn cezakirin, dadgehê cezayê wan taloq nekir. Cezayê polîsê bersûc N.D hat taloqkirin.

**2ê Berfanbarê, 2022**

**Ji bo Farah Zeynep Abdullah bi hinceta ku "heqaret li çawîşê pispor Musa Orhan kiriye" daxwaza girtîgehê**

Lîstikvan Farah Zeynep Abdullah bi hinceta ku heqaret li çawîşê pispor Musa Orhan kiriye, tê sûcdarkirin. Hatibû îdiakirin ku Musa Orhan destdirêjiya zayendî li Îpek Er kiriye û Îpek Er ji ber vê yekê li navçeya Beşîrî ya Êlihê întîxar kiriye. Lîstikvan Ezgî Mola der heq vê bûyerê de parvekirinek kir û bi hinceta ku heqaret li Musa Orhan kiriye cezayê pereyî lê hat birîn. Farah Zeynep Abdullah jî bo piştgiriya Ezgî Mola bike parvekirinek kir û li ser vê yekê doza heqaretê li wê jî hat vekirin. Ji bo Abdullah heta 2 sal û 4 mehan cezayê girtîgehê tê xwestin.

Îpek Er bi debanceyê hewla xwekuştinê kir û piştî 34 rojan di 18ê Tebaxa 2020an de li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Îpek Er di nameya ku li dû xwe hişt de nivîsiye ku çawîşê pispor Musa Orhan destdirêjiya zayendî li wê kiriye. Musa Orhan li 1emîn Dadgeha Cezayê Giran a Sêrtê bi sûcdariya "êrîşa zayendî ya wesfdar", negirtî tê darizandin û 12 sal cezayê girtîgehê jê re tê xwestin.

**Wezareta Karên Naxweyî li Şaredariya Nîlûferê lêpirsîna LGBTI+ê da destpêkirin**




Wezareta Karên Navxweyî ragihand ku piştî nûçeya ku Şaredariya Nîlûferê ji bo LGBTI+yan navenda piştevaniyê ya taybet vekiriye, lêkolîn û lêpirsîna destpêkê dane destpêkirin.

Di daxuyaniya ku ji teref şaredariyê ve hat dayîn de hat diyarkirin ku navenda ku di bin navê "Yekîneya Wekheviyê" de hatiye avakirin li Tirkiyeyê yekemîn navenda piştevaniyê ye ku di nava şaredariyekê de hatiye avakirin û xizmeta kesên LGBTI+ dike.

**Doza daxuyaniya çapemeniyê ya kedkarên tenduristiyê yên Wanê**

Rûniştina yekemin a doza kedkarên tenduristiyê yên Wanê di 2ê Kanûna 2022an de pêk hat. Yekitiya Bijîşkên Tirk (TTB) di 8ê Sibata 2022an de ji bo başkirina şert û mercên xebatê banga grevê ya bo 2 rojan kiribû. Li ser vê bangê, li Wanê Kedkarên  tenduristiyê xwest daxuyaniya çapemeniyê bidin.  Li ser vê yekê jî der heq wan de doz hat vekirin.

Li ser banga TTBê, kedkarên tenduristiyê ku di nav wan de Serokê Odeya Bijîşkan a Wan-Colemêrgê Huseyin Yaviç û Hevserokên Sendîkaya Kedkarên Tenduristî û Xizmeta Civakî (SES) yên Şaxa Wanê Zeki Seven û Figen Çolakoglu hebûn, xwest ku li ber Nexweşxaneya Perwedehî û Lêkolînê ya Herêma Wanê daxuyaniya çapemeniyê bidin. Kedkarên tenduristiyê du pankartên bi nivîsên "Em di 8ê Sibata 2022an de di greva Spî de ne" û "Em ji bo mafên xwe yên desteserkirî di grevê de ne" vekirin û xwestin ku bicivin, lê polîsan destûr neda daxuyaniyê.  Piştre, li 1emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Wanê bi hinceta "dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan li kedkarên tenduristiyê doz hat vekirin.

Di danişîna ewil a dozê de parêzerên bersûcan di parastina xwe de daxwaza beraetkirina kesên tên darizandin kirin û diyar kirin ku daxuyaniya çapemeniyê mafê makezagonî ye. Dadger danişîn taloqî 17ê Sibata 2023an kir.

**3ê Berfanbarê, 2022**

**Li 43 xebatkarên tenduristiyê yên ku çawîşê pispor ê ku li doktor xistibû protesto kirin ceza hat birîn**

Xebatkarên tenduristiyê li Nexweşxaneya Perwerde û Lêkolînê ya Muğlayê, di 14ê Adarê Roja Tibê de dema Ali Aladağlı ji nexweşxaneyê derdiket bi çepikan protesto kirin. Çawişê Pispor Ali Aladağlı ji ber nexweşiya xwe li nexweşxaneyê derman dibû, bijîşk Tahir Tarimer idîa kir ku Aladağlı ew derb kiriye. Serokatiya Lijneya Teftîşa Wezareta Tenduristiyê der heq xebatkarên ku Aladağlı protesto kirine, lêpirsîn vekir. Di encamê de li 43 xebatkarên nexweşxaneyê ku di nav wan de bijîşk, ebe, hemşire û personelên nexweşxaneyê hene, cezayên wek, “birîna meaş”, “sekinandina pêşketina pileyî”, “hişyarkirina nivîskî” hatin birîn.



Di raporê de ku bi îmzeyên Wezîrê Tenduristiyê Fahrettîn Koca û Serokê Lijneya Teftîşê Davut Eker der çû, bo cezayên navborî hincetên wek “rûmet û baweriya karmendên dewletê hejandine”, “zirar dane kesên ku peywirên xwe pêk tînin”, “dijberiya şertên peymanê kirine” hatin nîşandan.

**8ê Berfanbarê, 2022**

**Wezareta Çandê fona ku da fîlmê Emin Alper bi faîza wê bi şûn ve xwest.**

Wezareta Çand û Tûrîzmê fona ku ji bo piştgiriya fîlmê Emin Alper ê bi navê "Rojên Ziwahiyê" daye, bi şûn ve xwest.  Yek ji hilberînerên fîlm Çîgdem Mater e ku di doza Geziyê de hatibû girtin. Emin Alper got, "Niha bi mekanîzmayeke sansurê ya nerasterast daxwaza vegerandina pere li me dikin. Mixabin, wezaretê pêvajoyek da destpêkirin ku vê gavê hemî derhêneran tengezar dikin." Alper, da zanîn ku piştî 20 mehan, Midûriyeta Giştî ya Sînemayê ya Wezareta Çand û Turîzmê, fona ku ji bo piştgiryê dane tevî faîzê bi şûn ve dixwaze.

Serîlêdana bo fonê, di Mijdara 2018an de hatibû kirin. Li gorî daxuyaniya Alper, piştî pêşnûmeya yekem, guhertinên ku di senaryoyê de di pêvajoya pêşdebirina projeyê de kirine, wekî sedem hatine destnîşankirin. Alper got, "Ev biryar 20 meh piştî ku me halê dawî yê senaryoyê tevî hemû guhertinan pêşkêşî Midûriyeta Giştî ya Sînemayê kir hat dayîn. Her kesê ku bi xebata pîşesaziya sînemayê re aşna ye vê yekê pir baş dizane: Senaryo ji dema ku têne nivîsandin heya roja kişandinê, di dema pêşdebirina projeyê de, di pêvajoya kişandinê de û di dawiyê de di pevbestînê de diguherin.  Berovajiyê wê li dijî xwezaya tiştan e. Mixabin Wezareta Çand û Tûrîzmê bi guhertina rêziknameyê ya di sala 2019an de, bi hinceta şopandina senaryoyan ji bo xebatên me pêvajoya sansûra vekirî dimeşîne."

**Doza 'Qirkirina Ermenan' li siyasetmedarên HDPê**

Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê der barê 11 endamên berê yên Lijneya Rêveberiya Navendî (MYK) ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ku di nav wan da Alp Altınors û Veli Saçılık jî hene, bi sedema ku di 24ê Nîsana 2021î de di daxuyaniya çapemeniyê de îfadeya "Qirkirina Ermenan" bi kar anîne, di çarçoveya xala 301î ya Qanûna Cezayê ya Tirk de doz vekir.  Sernavê xala 301î "Heqaretkirina li Tirkîtiyê" ye. Di îdianameyê de der heq gotinên di daxuyaniyê de hincetên wekî "Komara Tirkiyeyê xistine bin gumanê" û "li dijî berjewendiyên neteweyî yên neteweya tirk tevgeriyane" hatin rêzkirin.

**Doza Fatin Kanat**

Di 7ê Çileya 2022an de li 25emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê, der barê Hevserokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (IHD) a Şaxa Enqereyê Fatîn Kanat de bi hinceta ku propagandaya rêxistina terorê kiriye doz hat vekirin. Bo dozê wekî hincet çalakiyên komeleyê û daxuyaniyên çapemeniyê hatin nişandan.  Di rûniştina çaremîn û dawîn a dozê de ku di 8ê Kanûna 2022an de pêk hat Fatîn Kanat ji ber ku "hêmanên sûcê îdiakirî pêk nehatine" beraat kir.

**9ê Berfanbarê, 2022**

**Girtiyê nexweş ku hat îdia kirin ku li girtîgehê ketiye, jiyana xwe ji dest da.**

Li Girtîgeha Girtî ya Tîpa Tyê ya Şirnexê nexweşê pençeşêrê Emre Abalak (26) jiyana xwe ji dest da.




Rayedarên girtîgehê ji malbata wî re ragihandine ku Emre Abalak 2 roj berê li girtîgehê di serşokê de ketiye, xwînrêjiya mejî derbas kiriye û piştre ew birine Fakulteya Tibê ya Zanîngeha Dîcleyê ya Diyarbekirê.

Parlamenterê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ê Kocaeliyê Dr. Omer Faruk Gergerlioglu di 3yê Berfanbara 2022yan de rapora kesên ku di navbera 1ê Berfanbara 2021î û 1ê Berfanbara 2022an de di girtîgehê de jiyana xwe ji dest dane parve kir. Li gorî raporê di salekê de 73 kes mirine.

Gergerlioglu der barê raporê de daxuyanî da û got, “Me ev îstatîstîk bi baldarî girtine û divê ez diyar bikim ku me ev hejmar bi derfetên xwe berhev kirine, xizmên girtiyan an jî parezerên girtiyan ragihandine.  Girtîgeh, Wezareta Dadê ti daxuyaniyê nadin."

**Doza Aytul Uçarê**

Hêzên Ked û Demokrasiyê yên Îzmîrê bi armanca piştgiriya berxwedana Boğaziçiyê,  di 3ê Sibata 2021î de li Alsancakê daxuyaniya çapemeniyê li dar xist. Polîsan  bi awayekî tund mudaxele kir. Ji Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) Aytûl Uçar, parêzvanên mafên mirovan Emîne Akbaba û Îrem Çelîkbaş hatin binçavkirin û bi hinceta ku heqaret li serokomar kirine der barê wan de doz hat vekirin.

Di rûniştina şeşemîn a ku di 9ê Kanûna 2022an de li 41emîn Dadgeha Cezayê Asliye ya Îzmîrê pêk hat de, dozger ji bo parêzvanên mafan ceza xwest. Dadgehê daxwaza demê ya parastinê qebûl kir û danişîn taloqî 30ê Kanûna 2022an kir.

**10ê Berfanbarê, 2022**

**Di doza Şenyaşaran de biryar di dadgeha îstînafê de betal bû**

Biryara doza Haci Esvet Şenyaşar û kurên wî Adil û Celal ku di êrîşa Parlamenterê AKPê yê Rihayê İbrahim Halil Yıldız û cerdevan û xizmên wî de di 14ê Hezîrana 2018an de li navçeya Pirsûsê ya Rihayê jiyana xwe ji dest dabûn ji aliyê dadgeha îstînafê hat xerakirin.

2yemîn Daîreya Dadgeha Edliyeyê ya Herêmî ya Entabê (îstînaf),  di encama îtiraza parêzerên malbata Şenyaşar û parêzerên malbata Yıldız de biryara 3yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Meletiyê betal kir.

Dadgeha îstînafê biryar bi van hincetan xera kir: raporên otopsiyê di pêngava dadgeha herêmî de nehatine xwendin û bi awayekî vekirî nehatine nîqaşkirin, nehatiye diyarkirin ku di encama kirinên kîjan bersûcî de Adil Şenyaşar miriye, û bêyî ku parêzbendiya bersûc Mehmet Şîmşek bê girtin biryara

mehkûmiyê hatiye girtin. Her wiha hat diyarkirin ku bersûc Fadil Şenyaşar ji ber sûcên hewla kuştinê ya bi qestî kêm hatiye cezakirin. Cezayê Fadil Şenyaşar bi tesbîtkirina tehrîka neheq bi rêjeya 2/3 hatibû kêm kirin. 37 sal û 9 meh cezayê girtîgehê li Fadil Şenyaşar hatibû birîn ku di bûyerê de bav û 2 birayên xwe winda kir û bi giranî birîndar bû.




Bûyer di 14ê Hezîrana 2018an de li Rihayê pêk hat. Parlementerê AKPê yê Rihayê İbrahim Halil Yıldız û cerdevan û xizmên wî di serdana kargeha malbata Şenyaşaran de êrîşî malbata Şenyaşar kirin û kesên ku di êrîşê de birîndar bûn rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Pirsûsê û êrîşên wan li nexweşxaneyê jî dewam kirin.

Hacı Esvet Şenyaşar, ji bo dîtina zarokên xwe yên birîndar çû nexweşxaneyê ew û her du kurên wî Adil û Celal Şenyaşar hatin qetilkirin.

Her çendî bûyer di heman rojê de pêk hatibin jî lêpirsîna der barê bûyerê de wek "kargeh" û "nexweşxane" bû du beş. Di doza erîşa kargehê de ku li 3yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Meletiyê pêk hat de di 2ê Nîsana 2021î de biryar hat dayîn. Di biryara betalkirinê ya di îstînafê de biryar hat dayîn ku ev her du dosyeyên dozê divê bên yekkirin.

Dadgeha herêmî li gel Fadil Şenyaşar, 18 sal cezayê girtîgehê li yek ji êrîşkaran Enver Yıldız birîbû. Enver Yıldız piştî bûyerê bi 18 meha li Edliyeya Rihayê teslîm bûbû. Dadgeha herêmî ji bersûcên din ên dosyeyê li Suleyman Yıldız 4 sal, 3 meh û 22 roj, li Abdurrahman Yıldız 11 meh û 23 roj, li Kenan Yıldız 4 sal, 8 meh û 18 roj, li Mustafa Yıldız salek, mehek û 14 roj, li Mehmet Yıldız 6 meh û 22 roj, li Nîhat Yıldız salek, 11 meh û 18 roj, li Halîl Îbrahîm Şîmşek 3 sal û 9 meh, li Mehmet Şîmşek 2 sal, 6 meh û 10 roj, li Mehmet Yıldız 2 sal 6 meh û 10 roj cezayê girtîgehê birî. Li bersûcê negirtî Ferît Şenyaşar ceza nehat birîn. Der heq İbrahim Yıldız de biryara girtinê hebû, lê ji ber ku nehat girtin, dosyeya wî hat cihêkirin.

**Dadgehê, biryara Dadgeha Makezagonê pêk neanî, Haci Bogatekin dîsa çû Dadgeha Makezagonê**




Rojnameger Haci Bogatekin der barê Mehmet Metiner ê ji Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP), di quncika xwe de wiha nivîsandibû: "Tu lader î yan çêlek î?". Ji ber vê nivîsê cezayê tezmînetê lê hat birîn. Li dû wê Bogatekin di doza ku li Dadgeha Makezagonê (AYM) vekir de bi ser ket. Lê belê dadgeha herêmî biryara Dadgeha Makezagonê nas nekir.

Sernivîskarê berê yê rojnameya Akitê Huseyîn Uzmez ku ji ber îstismara zayendî ket girtîgehê, der heq Methmet Metinerê AKPî de gotibû; Tu lader î yan çêlek î?". Bogatekin di qunciknivîsa xwe de ku di rojnameya Gerger Firatê de, di 9ê Îlona 2011an de li Adiyamanê derketibû, ji peyvên Husyin Uzmez jêgirtin kiribû.

Di doza ku li ser giliyê Metiner hat vekirin de, 9emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Stenbolê di Çileya 2013an de 3 hezar û 500 TL tezmînet li Bogatekin birî. Bogatekîn biryar bir Dadgeha Makezagonê û di Mijdara 2017an de di têkoşîna xwe ya hiqûqî de bi ser ket. Lê belê dadgeha herêmî biryara Dadgeha Makezagonî nas nekir û daxwaza ji nû ve darizandinê ya Bogatekin red kir.


Li ser vê yekê Bogatekin serî li dadgeha îstinafê da. Lê belê dadgeha îstînafê bi hinceta ku "mecburiyeta pêkanîna biryara Dadgeha Makezagonê nîne" dadgeha herêmî mafdar dît. Piştî biryara Dadgeha îstînafê, Bogatekin dîsa serî li Dadgeha Makezagonê da.

**10ê Berfanbarê, 2022**

**Bi hinceta ku heqaret li Serokomar kiriye, der barê rojnameger Mustafa Sonmez de doza çaremîn hat vekirin**

Bi hinceta ku heqaret li Serokomar kiriye (TCK 299), der barê rojnameger û aborînas Mustafa Sonmez de doza çaremîn hat vekirin.

Danişîna ewil a dozê ku li dû danezana sûcê ya Saziya Bikeyskirin û Venêrînê ya Bankavaniyê (BDDK) hat vekirin, li 38emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Stenbolê di 2yê Sibatê de dê bê dîtin.



Parvekirina Sonmez a medyaya civakî ku di 24ê Cotmeha 2021î de weşandibû wiha ye: "Pirsa navdar a "Gelo Seraya dînbûyî dê dest dîne ser diwîzê me yên li bankayan dîsa dubare bûye. Ji kesên ku dipirsin" Ez dibêjim, 'Ez nizanim', lê ez lê zêde dikim. Ji sedî 56ê hemî mewduatên li bankayan pereyên diwîz in. Dê dest dîne ser kîjanî? Dê çawa ji nav bineqîne? Xeman nexwin, ew tişt ne hêsan e. Berî ku bigihîje wê merheleyê, birayê we Abbas rêwî ye"

Der barê Mustafa Sonmez de beriya niha 3 caran bi hinceta ku heqaret li Serokomar kiriye doz hatibûn vekirin û her sê dosye jî bi beraetê bi dawî bûbûn.

**Li Xwendekarên Zanîngeha Bogaziçiyê doza #Ji niha û şûn ve li me ye**

7emîn rûniştina doza ku 54 xwendekarên Bogaziçiyê bi hinceta ku "dijberîya Qanûna Civîn û Xwepêşandanan kirine" û "kes ji Azadiya wan mehrûm hiştine" tên darizandin, di 12ê Berfanbara 2022an de li 49emîn Dadgeha Cezayê ya Asliyeyê ya Stenbolê pêk hat.

Xwendekarên Zanîngeha Bogaziçiyê di 1ê Sibata 2022an de ji bo piştgiriya 2 hevalên xwe yên di berxwedana Zanîngeha Bogazîçiyê de hatibûn girtin bi gotina #Ji niha û şûn ve li me ye banga çalakiyê kirin. Derketina xwendekaran a ji zanîngehê ji aliyê ewlekariya taybet ve hat astengkirin. Di vê navberê de 108 xwendekarên ku ji gelek zanîngehan ji bo piştgiriyê bidin daxuyaniyê hatibûn li derdora Etiler û Bebekê hatin derbkirin û binçavkirin.

Ji ber ku derketina wan a derveyî zanîngehê hat astengkirin, xwendekaran dan zanîn ku ew ê li kampusê çalakiya xwe li dar bixin, li ser vê yekê xwendekar bi mudaxeleya polîsan ji kampusê hatin derxistin û 52 xwendekar bi lêdanê hatin binçavkirin.

Biryar hat standin ku kêmasî bên tekûzkirin û CDya dosyeyê ji bo verîştinê ji pispor re bê şandin, rûniştin taloqî 22yê Adara 2023an saet 13.30ê hat kirin.

**14ê Berfanbarê, 2022**

**Li Serokê Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê (İBB) İmamoglu re bi îdiaya ku "heqaret li endamên YSKyê kiriye" cezayê girtîgehê û qedexeya siyasî hat birîn.**

Li Serokê Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê (İBB) Ekrem İmamoglu, di doza ku bi îdiaya "Heqaret li endamên Lijneya Hilbijartinê ya Bilind (YSK) kiriye" tê darizandin de 2 sal, 7 meh û 15 roj cezayê girtîgehê hat birîn. Li gorî xala 53emîn a Qanûna Cezayê ya Tirk biryara "qedexeya siyasî" ji bo

İmamoglu hat dayîn. Ger biryar di pêvajoya dadgeha îstînafê û Dadgeha Bilind de bê erêkirin dê teqez bibe. Ger ceza bê erêkirin, İmamoglu dê rojekê li girtîgehê bimîne û derkeve, şaredarî û endamtî ya wî ya CHPê jî ji holê bê rakirin. Di pêvajoya înfazê de wê ji mafê hilbijartinê bêpar bimîne.

Di hilbijartinên 31ê Adara 2019an de Ekrem İmamoglu wekî Şaredarê Bajarê Mezin ê Stenbolê hate hilbijartin, lê hilbijartin hat betalkirin û di 23ê Hezîrana 2019an de careke din hilbijartin çêbû û İmamoglu bi rêjeya ji sedî 54,22 dîsa bi ser ket. Wezîrê Karên Naxweyî Suleyman Soylu li dû vê serkefinê heqaret li İmamoğlu kir. Ekrem İmamoğlu axaftina xwe ya ku bû mijara heqaretê li ser vê yekê kir. Soylu, bêyî ku navê İmamoglu yê ku ji ber civîna Konseya Ewropayê ya sala 2019an çûbû Fransayê got, "Ez ji ehmaqê ku çûye Ewropayê û giliyê Tirkiyeyê kiriye re dibêjim. Ev gel wê hesabê vê yekê ji te bipirse”. Di heman rojê de li Stenbolê dema İmamoglu daxuyanî dida rojnamevanan, ev gotinên Soylu hatin bibîrxistin, li ser vê yekê İmamoglu got, "Yên ku 31ê Adarê betal kirin ehmeq in."

Têkildarî vê bersivê bi danezana sûcê ya nivîskî ya YSKyê, Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê lêpirsîn da destpêkirin. Îdianameya ku ji teref Serdozgeriyê ve hatibû amadekirin di 28ê Gulana 2021î de ji teref 7emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Anadoluyê ve hatibû qebûlkirin û ji bo İmamoglu pêvajoya darizandinê bi daxwaza cezayê girtîgehê û qedexeya siyasî dest pê kir.

İmamoglu di îfadeya xwe de got ku muxatabê wî Soylu ye. Parêzerên wî daxwaz kir ku dadgeh wekî şahid bangî Suleyman Soylu bike, lê ev daxwaz ji aliyê dadgehê ve nehat qebûlkirin.

Di wê navberê de, di sala 2018an de kesekî ku ji bo Serokê Giştî yê YSKê yê wê demê Sadi Guven peyva “konê rojhilatî yê bêxislet” bi kar anîbû, ji sûcdariya “heqaretê” beraat kiribû. Parêzerê Guven dosye bir dadgeha îstînafê, lê piştre dev ji serîlêdana xwe berda.